

ROJA NÛ

XWEDÎ Û GERÎNENDE: MÎR Dr. KAMIRAN ALÎ BEDIRXAN

Kiriyariya Roja Nû: ji bona erdên Sûriye û Lîbnanê. 35 likeyên Sûrî; ji bona welatên din 4 likeyên inglîzî. Bihayê Hejmarekê; 25 Qemerî.

Diwan û gerfendekariya Rojname: Êrût-Birc: Weqîf Tabet, Telefona Diwanê: 74-04; Telefona Malî Xwediyê Roja Nû: 84-41. Edresa telg: Êrût-Rojanû.

Rojname Dinivîsîn

Armanca Komela Komunistên Kurdistanê

- 1— Xebateke zor qewî ji bona xelaskirina Kurdistanê ji lepê istimariyan û zorkeran; û danîna yekîtiyekê; di nav bira hemî kurdan de, bê ferq ew ji kîjan welatê ji bibin; da ku armancên komelê here serî ya ko azadiya welêt e.
 - 2— Danîna hikûmetêke kurdî; li ser bîngê û asasên sosyallîstîk da ko ew hikûmet bi kêrî hemî xelkên Kurdistanê bê.
 - 3— Çêkirina ordiyêke kurdî ji zexmî û xurt ji îro û pêde; ji bona serbestkirina Kurdistanê û miletê kurd; û parastina Cîmhûriyeta Kurdistanê ya ko dê bête danîn.
 - 4— Kurd hemî bê ferqên dîn û diyanetê divê herin xwendegahan, çî keç û çî xort; û ji bona wan di Cîmhûriyeta Kurdistanê de xwendegah, zanistê û zanîngehine bilînd dê bêne çêkirin.
 - 5— Jin û mêr di heqên xwe yê komelî û siyasîyê de divê mîna hev bin.
 - 6— Bi hemî komelên ko zidê diktatorî û zorkerîyê ne, divê tevkarîyek bête danîn.
 - 7— Ji bona vejandin û xweşiya Kurdistanê û azadiya wê, xebata çak a destpêkirî, divê bête pêşve ajotin.
 - 8— Armanca Komela Komunistên Kurdistanê ev e ko Kurdistan divê ji destê zîlm û zorkerîyê, ji lepê istimariyê û diktatorîyê bête xelas kirin û tê de hikûmeteke wîlo bête danîn ya ko bi kêrî hemî sinf û tebeqeyên miletî tê û her kes tede arîkariya hev û du dikin.
- Ev bangin di Rojname Elbirzê de hatiye çap kirin li bajarê Reşê. Iran Kînûnî, Rojnameya ko di Tehranê de tête çap û belav kirin; jê girtiye. Iran Kînûnî; Sal Yazdehim; Şimare 37-261, 1 şepê 2, De, 1323.

R. Çorçil û Kurd

Nivîsevanê ingilîzî Mirza Randolph Çorçil; li ser pîrsê Azîrbîcanê bendek nûvîsandîye, ya ko di rojname Organê de ji hatiye çap û belav kirin; û di wê bendê de, wî nivîsevanê gata Kurd û Kurdistanê jî kirîye; ewe tiştên ko randolf Çorçil li ser nijadê kurd dibêje: Pîrsêke Kurdistanê jî heye. Kurd bê şik miletê xurt in, lê nikarin ji xwe re hikûmetêke deynin. Kurdistan erdekî biçûk û feqîr e; û zehf perîşan û belengaz e; û ji ber sebebên cîgrafî, siyast û pasrojmendîyê, nikare tu caran bibe hikûmetek.

Kurd ji niqta welatîniyê; ji tu melatî ne kêmîr e; û zîlm û zorkerî û cefayîne giran ko di heqê wî miletê de, hatiye kirin, miletê kurd yekcar zexm û dijwar kirîye. Oriyan — Hejmar: 5648-1946 Roja — Nû: Zade fîl-tenbûr nexmeten uzral

Welatên Rehelaî

Rojname frensîzîzman «Le Jour» ya ko li Êrûtê derdikeve, li ser pîrsê Kurdistanê benedêke nû û dût û dirêj çap kirîye û tede gotîye:
Selamettî, rahettî û pêşveçîna welatên rohelatê Nîzing û Navîn bi dostanî û arîkariya miletên tede çêdibe. Dostanî bê naskirina heq û rastîyê çênabe. Arîkariya mîna da dest in; divê bigihin hev û du, da ko deng jê derkeve.
Orta welatên rohelatê de heşt û heta neh milyon kurdên heq şênanî hene. Kurd ji zîlm û zorkerîyê; ji bîndestîyê acîz bûne; divê pîrsê kurdistanê bête safî kirin. Ev miletê cengawer û mîrxas divê bigêhe heqê xwe; û êdî her kes seh kirîye ko şênanîdana rûh û welatîniya wî miletî, ji destê tu hikûmetê nayê.
Le Jour-Hejmar «3443-1946» «3489 1946»

Radyoa Rohelaî

Radyoa rohelatî, êwara roja şêşembê, 12-ê sibatê 1946 li saatê heşt û çet û pênc deqîqan de, li ser pîrsê kurdistanê bi zîmanê frensîzî gotareke zehf hejra û girane belav kirîye û tede gotîye:
Heşt û heta neh milyon kurdên ko xwedîyê 530.000 kilomêtir çargûşê erd in ji bona azahî û serbestîya xwe kuştîna û hatîne kîştin; talan kirîna û hatîne talan kirin; di rîga mîhacîrîyê de, zîwar û perîşan bûne; lê kes nikarî bû eşqa welatê Kurdistanê jî dilê wan derîne û van çiyayîyên mîrxas têxe bin lepê xwe.

Axa Mirovan

Kovara «Axa Mirovan» li ser pîrsê kurdistanê benedêke mezin belav kirîye. Ev kovar li Parîsê derdikeve. Rojname Bêrûtê a frensîzîzman «Orient» di hejmarên xwe yê 5.669-û-5670 ev bend çap û belav kirîye.

Keyreta Mihafîzê Cezîrê

Mihafîzê Cezîrê ê bilîndîmet, her wekt nûçegîhahê me didê zanîn, ji bona çakîya rûnîştîmanan bê westabûnê dixêbete. Ji alîkî teşkilatên dewletê tene teqûz kirin; yê keşafîyê tene danîn; ji aliyê din xwendegah û meydananê bedenparezîyê tene awakîrin; pîr û rê û westezanîyê nû, axa Cezîrê di gîhînin xweşiye. Himêta Mihafîzê her û her hebe; serfrast û serbîlîndahiya wî alîxwazo me ye, ji xwe, ji wextê ko Ebdîlqadîr Beg Mîdanî hatiye Cezîrê; karên Hikûmetê, ji her wextî bêtir rast û dîrîst bûne.
Ebdîlqadîr Beg Mîdanî, ji wîdcan, paqîjiya xûlû û ewlaq, bêterefîya qerarenê di xwe; nav û deng daye; û em pê zehf îftîxar dikin.
Li Dêra Zorê Xalîb Beg Mirzo; li Cezîrê Ebdîlqadîr Beg Mîdanî xebatkerên qencî, xweşiya, kamîranî û rahetîya nijad û milet in.

Pîrozname dîwana Cegerxwîn.

Selavê ko li der birca weşîyan Bi xwîn xwarî civandîn binamî bûbon Bi misk û ember û rêhan û damor We tavên biharê lev nedîndor Ne bes ev jî selavê pîr mubarek Li te herdem cegerxwîno bi carek Dema hilgirtî dîwana te anî Me ew girt û li ser çavên xwe danî Hemî ev ayetê kurd in dizanîm Ji weşîyan ew jî lihanî nîzanîm Bi sed can û dil min kir ye pîroz Çî xweş roj e li minbû cejîn û newroz

Hezar û neh sed û sala çî û pênc Serê fesla biharê lawekî gênc Me nêrî yûsîfe şêrê li cenge Ewî jî wek me can û dil pereng e Bîlez hat û beşûş û dev li ken bû Bi roj başî digel min ba xeber bû Li destê wî kitêba zendê usta Go da xwazek te min anî helista Tu bawer bê li pêş min bûye sor gul Wekî bilbil li min xoş bûn kulên dil Fena qîzek ciwan û çav rêş û toz Ji ber sînga xwe der na xim şev û roz

Kovar û Rojnameyên kurdî

- Caladet bek deranî bome dâ Kovar bi nazdarî Dike gazî li kurdan ew dike gêrîn û hawârî
- Şiyar kir milletê Kurdî bi Hawar û bi Ronahî Vejandî milletê Kurdî dîxam sondî bi tlahî
- Du Rojname ji bo kurdan deranî Kamîranê çak Yekî Rojbû yekî Stêrbû dinav ala welatê pak
- Bi Roja-nû gelek şabûn tu bawerêbê şehemî tro Tîrêjên xwe belav kirîye li ser ala welatîmîro.
- Bizan tro dinav kurdê Iraqê da bi babanî Gelawêj, Gîtîyî-Taze hemî derîtên bi Soranî
- Digel wê Komela Jîné vejandî milletê kurdî Bi xweşxwanên xwe ê rengîn bi dirokên xwe ê zendî
- Li Rawanê binêre wa Rîya-Taze ji nû der lê Bi zarê kurdîya Amed bi tîpên kurdîyê der lê
- Li nav kurdê Lehtcanê bi zarê kurdîya Mâkran Deranî Nîştîman wa da bîjîn serdest wekî mîran
- Dikin hêvî ji Yezdanê dilwanê xwendewerîna Ko her pênc perçeyê kurdan bigîne hev ji bo wan ra
- Bi gortê serê xemgînê kurdan bo welatê pak Bese xemgîn bike gazî hemî kurmanc a şiyar bun çak

Amuda - Xemgînê - Cemlê - Seyda

DELAL

Delalo, delalo, delal... De rabe, emrê dilê min bi kulf, Sebrê dilê min bê te nayê, delal! Delalî, delalî, delal... Yarê delalî suwarê me suwar bûne. Berê xwe dane rakê rojhelatê. Pêşîya sîwara danî bû girekê li Sêrta de. Xwezî ji xêr û miradê Xwedê re, Ezê bibûma baqekî gulên û rêhana, Ketîbama destê lawikê xwe de. Da bi rojê se cara keftibama xala bihna qeftê di sembêlê reş de. Delalî destê min berde. Kolanê di gundê me teng û tari ne. Xelkê di wî zemanî Şeytan a awên in. Bi henceta sêl û agirî dê ên, ser halê di min û te de. Delalê delalî... De rabe, emrê dilê min bi kulf, Sebrê dilê min bê te nayê, delalol...

Delalî yê malê di xewa gêrîn de ezê dil na dim. Delalî yê malê ji xewa gêrîn rakim. Ezê herim sîka Diyarbekra şewîf, Ebayekî sorî Besrawî ji kenarî delalî malê bikirim, Li mila kim. Delalî... De rabe, emrê dilê min bi kulf, Sebrê dilê min bê te nayê, delalol... Delalî... Herçî cûhabekî ya xêrê, Jin enarî delalî malê ji min bî-tîk Ezê bidimê zêr û zîvê û malê dinê. Heker pê qall na bit, Sed û bîst aqê di mala babê min hene, Ezê bidimê ciwanîka li ber mehinê. Delalol delalol delalî... De rabe, emrê dilê min bi kulf, Sebrê dilê min bê te nayê, delalol...

Belê ew zengîlê jîna welat e Dîbê ra bin gellî kurdan xebat e Eger rabî jî her alî bicarek Welatê xo jî çar goşan bikin yek Gelek şerme bese êdî ne razîm Me darxwazek heyê îro bi xwazîm Dîtîrsîm fîrsetek wek vê ne bînin Li bin destê sîtem dîse bi mînan Cîvata ko li (fîransîsko) dirûnê Peyamek me heyê ew dê bîxwîné Gelek komel jî nû dê bêne danîn Di wan de wê vekî bend û qewanîm Ne wek bend û qewanîné zîlîmker Serê roja îdalet der kete der Meger roja sîtem va çûye êvar Bîmin bawer be em bûnexwedî par îdalet hakim, serdar û mîr e Sîtem berpîrsîyar e wek esîr e Hêçî kovar û rojname welat in Bi yek dengî hemî îro di bakîin Bi dil xurtî bi mîzgînî diçîn hev Cîhan tev bûye ronî lê nema şev Cegerxûn bi xwe ew bûye rêber Dîbê vaye rîya rast e bidin ser. Bîmin ew serwerê dewra evlne Xuda her wî bi jîndarî bibîne Bi noqarî deranîn dût jî behran Kelasîk gîş li hawîr mane heyran Wekî-Xanî-dîgotî sar e bazar Ne hin îro jî dur rê re xerîdar Durê bo wî bîde ko pê bizanê Xudanê kûmirê qîmet çî zanê Bi wî meyyer li nik her kes ne nasî Evîndarê îî meyxanê dinasî Ji destê aşîqan caua evîné

Te, girtî da ko diljaran vejîné Li ber awaz û dengê te hero çend Wekî, fîrhad, û, Mem, rabûn bi govend Bi xoş xwanê te hîşyar bû (Herîrî) Digel (Xanê) û (sîyapoş) û (Cîzîrî) (Feqî) (hafîz) jî şêrazê derîne (Ebû mîslîm) digel (wanî) verxwîne (Zîbeyr) û Hacî Qadîr betlê arî Wekî Pertew begê mirê hekarî Ji yû melkî û esîrî ta bi nall Meger tev bûn bi dilşadî û helalî Ji derdê te ne şîn dîse xeber dîn Hemî jî phelewân û kurd û merd in Dilê te ruhînya çapa (hewar e) Tîji derdê û kul û kovân û ar e Ji lawîrî heta îro te jî jan dî Weke pîrê muxan îşqê revandî Ji bo jîna welat û milletê xwe Gelek cewr û cefa dane serê xwe Te can û dil di vê rê de helandin Bi daxa agîrê îşqê kewandin Seda dengê te da bîrc û dîyara Gîha eywanê (Kesra) milkê dara Bîjî dilgêş hevîr, seyda Cegerxûn Nebe xemgîn li wan roj û demê çûn Bîjîn xortêna ciwan her tim bîjîn be Ji ber cana welat ez bûme kalo Bi gorî bê jî bo we Namî her dem Dîbit ev car digel me hemşîn dem Ji xew em tev sipîdê kirne hîşyar Bîjîn dîse hînermend û fidakar.

Tefsîra Quranê

47-Bêje: ma hon çi dibêjin û çi bawer dikin? Ko ezabê Xwedê bi gev an bi ro; bi awakî ko hon bi hatina wî dihesin an ji nişka ve, bi ser we de hat, ma ji miletên zalim û kafir pê ve, kî pê de bête qelandin û edimandin; lê kafir baweriya xwe pê nayênin.

48-Me pêxemberên xwe şandin; da ko ew mizgîniya bawermend û xerkeran bidin û kafiran bi ezabê dojhê bitirsînin; yên ko baweriya xwe afirne û nefsa xwe dirust kirine; ji bona wan tirs û êş utne û ew xemgir na bin.

49 Lê yên ko derew bi alî ayetên me ve dane wê bêne êşandin û cezayê kirina xwe a kirêt de bikişînin.

50-Pêxemberê min bêje: ez ji we re na bêtîm xezîne «Gencîneyên» Xwedê û dewlemendiya di wî li ba min e; ez ji we re na bêjim; ez dizanim û ne jî, ji we re dibêjim, ez melyaket im; ez tabî ayetên Xuda me, ko ew ji min re dide dahatin; wehî dike.

Bêje: ma kor û bîna mîna hev û du ne; bala xwe bidin, çavê xwe vekin û bîr bibin.

51-Û bi ayetên Quranê; çavê mirovên ko ji roja piştadawiyê û ji civana wê rojê û ji vegera xwe ba Xwedê tirsîyar in; veke; bila ew bizanin ko ji wan re, di wê û wa dinê de ji Xuda pê ve sermîyan û arfar nîne; da ko ew emr û ferma nê Xwedê bînin çih û dest ji xirabiyê bikişînin û ji Xwedê bitirsin.

52-Yên ko sibe û êvarê ibadetê dikin û lavekarê dîna rûyê Xwedê ne gava ten nik te; her çend jî ew jar û belengaz in; ji xafa xwe wan me qewirîne; guh me de gotina mezin û dewlemendan yên ko vî tiştî ji te dixwazin; ne tu ji hal û kirina wan û ne jî ew seba te berpîrsîyar dibin. Belengazin hene ko qedrê wan li ba Xwedê ji dewlemendan zehf mezintir e. Heke te ew belengaz qewirandin, ji zaliman dibî.

53-Herwekî di îşên dinyayê de, wiha jî di pîrsa baweriyê de, me hin ji hinan zedetir kiriyê; seba dilpakî û imana wan ji serekên di wan çêtir girtiye; da ko gewreyên Qureyş bibêjin: ev in yên ko Xwedê ji me baştir dîtiye, em serekên wan in; ew peyayê me ne!

Ma ji Xwedê çêtir kî mirovên şikirdar û dilpak nas dike?

54-Gava jên ko baweriya xwe bi ayetên me anîne ten nik te, mizgîniya rehma Xwedê bi wan de; û bêje: heçî ji we ko ji nezaniyê û bê hemda xwe neçeyiyekek kirine û paşî tobedar bûne û ketine riya rastî û qencyê Xwedê efiwa qisûra wan li xwe girtiye; Xwedê mezin, keremkar û piyar e.

55-Em ayetên xwe, bi vî awayî didin zanîn da ko riya rast û riya mirovên ne baş ji hev û du kifş bibin.

56-Bêje: Her wekî bi ayetên Quranê yekîtiya Xwedê nas e; ez çawan dikarim ibadeta pûtên we

bikimîyên ko we kiriyê hempayê Xwedê û perestişî wan dikin. Minê guh bidaxa daxwaza we a xwar; min riya xwe a rast şaş dikir û jê derdiketim.

57-Bêje: binêrin; min daye pey emrê Xwedê û Qurana ko ji min re hate dahatin; heçî hon; derewan bi alî Xwedê ye didin; hon xwe dilezînin; lê bizanin ko roja piştadawiyê û ezabên di wê ne di bin hikmê min de ne; hikmê wan di destê Xwedê de ne; ew li gora kevine û rastiye hikmê xwe wê bide; û hakimê adildir û mezintir ew e.

58 Hon xwe dilezînin; heke dana ezabê destê min de biwa, roin ê bilez hon biedimanda. Xwedê dema êşandina zaliman li ba xwe daniye.

59-Mifta tiştên nepenî û veşartî li ba Xwedê ye; ew dema roja piştadawiyê, çaxê hatina baranê; di zikê diya xwe de zaro heke keç an kur in, sewab û gunehên mirovan, ceza û mikafata wan dizane; xezîneya xeybê di destê Xwedê de ye; hemî tiştên bej û avê jê re nas in; bê zanîna wî pelê darekê na keve erde; dawîya libê ko di tariya axê de veşartî ye, û her tiştên erdê ên şil û hişk ên bi can û bê can li ba wî kifş in û li cem wî nivîsandî ne.

60-Gava hon radizin Xwedê ye; yê ko ruhê we dibe ba xwe û ko roj bû we hişyar dike û tiştên ko hon di nav rojê de dikin jê re nas in; piştî xelaseka jiyîna we honê vegerin ba wî û ew kar û emelê we û hikmên xwe şafî wê de bide.

61-Xwedê serdar û sermîyanê mirova ye; girtin û berdan di destê wî de ne; Xwedê melyaketên xwe dişîne ba we, ew emelên we ên qenc û xerab di nivîsîn û gava wexta mirina yekî ji we hat melyaket ne berî û ne piştî, lêbelê di dema xwe de, ruhê wî di şifînin.

62-Piştî wî ruhê mirovan tene spartin Xwedê; sermîyanê wan ê bilintir.

Ma hikim ne di destê wî de ye? Xwedê hikmê xwe ê rast lez û bez dide; tu hakim di kirina edaletê de, ne bi qasî wî bi lez e.

63-Bêje: we ji mij û moran û tariyê; ji helaketên bej û avê kî diparêze û difilîtişne? Gava belaf û betarek bi ser we de te, hon bi dizlka an aşikare dia û dirûtan dikin û dibêjin: Xudayê me, em ketine bextê te, ko te em ji vî belayê felitandin, em ji dil, û bi dilekî rast şikirdarên te dibin.

64-Xwedê, ji kerem û comerdiya xwe, we ji wan helaketan û ji hezar xêm û belayên din xelas dike, lê di piştî re hon radibin û pûtên xwe dikin hevber û hempayên di wî.

65-Bêje: Ew dikare ji jêr û jor hezar bela bîne serê we; bi terfêqatan û dubendiye berberî tixe nav we, û we bi destên hev û du bide kuştin û êşandin.

Binêre... çawan em ayetên xwe şafî xelkê dikin; da ko ew te

bighên, seh bikin û pê bîrewar bibin.

66-Heke qewmê te Qureyş, derew bi alî kitêba Xwedê a rast, Quranê ve didin, bêje wan: parastina we ji xirabiyê ne karê min e.

67-Ayetên Quranê rast in; û her wekî hatiye gotin wê çêbibe û honê bibînin û zendemayî bimînin.

68-Gava ew zimandirêjiya ayetên me dikin û henekê xwe pê, tînin, ji wan here dîr, heta hingî; bes vê gotinê kirin; û li ser tiştêkî din axaftin; heke qeytên ev emrê Xwedê ji fikra te da derketin; vê ayetê bîne bîra xwe, di civata wan de rûmene û ji wan veqete.

69-Misilmanên ko ji naçariyê di civata wan de rûdinin, ji gotina kafiran berpîrsîyar û pê gunehkar na bin; û heye ko şîretê misilmanan kafira digihînin ser riya kevine û rastiye.

70-Pêxemberê min... destê xwe, ji mirovên ko dîne xwe kirine lehîstok û henekê xwe bi Quranê dikin û bi jiyîna dinyayê hatine xapandin bikişîne; bes şîretan li wan hîke? û bîne bîra wan ko nefsên gunehkar di roja piştadawiyê de, wê bikevin dojhê û tê de, ji Xwedê pê ve kes ni kare mehdêra wan bike; û bibe arkarê wan; û ji bona zelaskirina nefsên xwe her çî wî bidin, ji wan na yê qebûl kirin; ewê bikevin ezabekî dijwar û cezayê gunehên xwe de bibînin; ewê avîne kelandî ve xwin; û ev cezayê kafîrbûna wan e.

71-Ma em kengê baweriya xwe ji Xwedê pê ve bi tiştêkî tînin; ko ne qenc û ne jî xirabiya wî dikare bigehe me; û piştî ko em misilman bûne; ma çawan em jê vedigerin bedîftîyê; û dibin weke mirovekê ko bi destê Iblls ji rê derdikeve; û hevalên di wî jê re dibêjin were, vegere ser riya rastiye; û ew di nav wan de, li erdê, şaş û zendemayî dimîne.

Bêje: riya Xwedê, riya rast e; û ji vî pê ve, tu rê nîne û ji me re emir hatiye dayîn ko em bibin misilman û nefsa xwe bispêrin Xwedê.

72-Divê hon nimêja xwe bikin; ji Xudayê xwe tirsîyar bibin û bizanin ko honê vegerin ba wî.

73-Xuda ye ko erd û ezman afirandine û pê mezinahî û qidreta xwe pêşî me kiriyê; û di roja piştadawiyê de Xuda gava dibêje bimirin; her kes dimire û gava dibêje rabin her kes ji xewa mirî; ne hişyar dibe û radibe; gotina wî heq û rast e; delîl û sermîyanê roja qiyametê û xudanê dema pîrkirina boriyê jî, ew e; veşartî be, aşikare be; her tişt jê re nas û xuya ye; ew di tevdrên xwe de fêris e; û agahdarî her tiştî ye.

74-Bîne bîra xwe... gava Ibrahim ji bavê xwe Azer re digot: tu pûtan ji xwe re dikî Xwedê? û li vî zêde dikir: te û qewmê te; we bi awakî egkêre riya xwe şaş kiriyel.

75-Me, ji aliye din jî spehîtiya erd û ezmanan şafî Ibrahim da; ta ko baweriya wî pê tekûz bibe; û bibe bawermendekî xurt.

76-Gava şev bi ser wî de hat û wî stêrek li ezmanan dît, ji xwe

re got: gelô ev e Xudanê min! û çaxa ko stêr çû ava, wî got: ez ji tiştên ko winda dibin hez na kîm.

77-Û wextê ko Ibrahim derketina heyvê dît got: gelô ev e Xudanê min! û dema ko heyv çû ava got: heke Xudayê min ji kerema xwe min na gihîne riya rastiye; ezê yek ji yên rêwinda-kirîme.

78-Gava Ibrahim bilavetina rojê dît gote xwe: ev ji stêrên din mezintir e; Xudanê min ev e; lê gava roj çû ava, Ibrahim ji miletê xwe re got: min héviya xwe ji tiştên ko hon dikin hevber û hevriyê Xwedê bîrî ye. û destê xwe jê şuştîye.

79-Binêrin û bizanin... ez berê xwe bi dilekî pak ji wî Xwedê re didim yê ko erd û ezmanan afirandine û ez ne ji wan im ko pûtên xwe dikin hevber û hempayê Xwedê.

80-Miletê wî jê enîrî û pê re pevçûn; wî got: ma hon dikin li ser Xwedê bi min re pevçûn; ez ko ez gihandim riya rastiye; ez ji pûtên we yên ko hon dikin hevberê Xwedê na tirsim; tuxirabiya wan na gihe min; meger ko Xwedê bixwaze; zanîna xudanê min dora her tiştî digire; ma hon na xwazîp çavê xwe vekin, rastiye seh bikin û pê bîr bibin.

81-Bê ko destûrek dakeve we; hon radibin û li gora eqîlê xwe pûtên xwe dikin hevberê Xwedê û di kirina vî tiştî de ji Xwedê na tirsin; ma êdî çîre ez ji pûtên we bitirsim! Heke we têgehîşt, divê bizanin ji me û ji we kîjan dikare ji dawîya xwe ewle û emîn bibe.

82-Yên ko baweriya xwe anîne û bi mişrikiyê imanê xwe tarî ne kirine; û qail bûne ko Xwedê yek e û jwîl pê ve tu xuda nîne, ew ji ezabê na tirsin û ew ketine ser riya rastiye.

83-Ev hîcetên me ne, û me ev Ja Ibrahim; da ko ew pê çavê xelkê xwe veke; em her kesê ko dixwazin digihînin mertebeyên hikmet û zanîne ên bilind; binêre xudanê te zana û fêris e.

XANÊ

Berê Xanê li tîla:

Eskerê Osman Paşa li bînga mala xula

xula; xula-xula

Tavekî baranê hato li hiçka ebaya Bedir-

Xan begê, kekê Tîlî begî,

Terkiro şil-û-mîla...

Şevoka der şevî, wegla Malik wêrano,

Tu şîme şerî nektî ji eşq û dîla.

De rabe, rabe, fermaniyo, de rabe,

Fermana Bedir-Xan begê, kekê Tîlî

Begî, rabû ji Stembolê.

Berê xanê li rûwo,

Derîya derê li rûwo;

Osman Paşa şand Heleba xopan Topa-

qalê, Toqa mezin ji min re bê wo;

Xain ne bû li dewletê,

Xain bû li hikametê,

Dengê topan û tîfinga xweşê tî li pê me.

Şevoka der şevî, wegla Malik wêrano,

Romkê di kumsor ketine Cezira Hota,

Xirab kirin sençaq eştrata.

Berê xanê bi lalka:

Eskerê Osman Paşa ti bînga mala hika,

hika:

Heyfa min têt wê heşfê; hate girtin, Eşe-

fê lottî Teherê Meymo digel girgirê eştra

Cezira Bota.

Şevoka der şevî, wegla Malik wêrano,

Romkê di komsort ketine Cezira Bota,

Xirab kirin çihê zavan û bûka.

Strana Kurdî:

D E L A L

PÊJINÛN DINYAYÊ

KEJÊ

Saliyê Naso dibêjît:

Wey lê, Kejê, te kir, te kir, lê
lê te kir, te kir,
Wey lê, Kejê, mal xirabê, te
gulekî bi dilê xwe kir,
Te destê min ji Mîrê Paloyê ve-
kir.

Xatûn Kejê dibêjît

Erê, Saliyê lawo, min kir, min
kir,
Min destê te ji Mîrê Paloyê ve-
kir.

Dê hêla bi çengelê sor Kejê
bigire û birevîne,
U bibe mala Mihemed Axa li
Diyarbekir.

Gava Kejê wa gotiye,
Saliyê Naso bi çengelê Xatun
Kejê girt û siwar kiriye,
Bi şev û rojê ajotiye.

Saliyê Naso dibêjît:

Erê, Kejê, tu here li nav Hîrlîma,
Kejê, li nav Zariya.

U ezê herim koçkêka xirabê.

Axayê giran digel min çiyê?
Xatun Kejê bi cihê Hîrlîman û
Zariya ve çiyê.

Saliyê Naso derê koçkê sekiniye,
Silavekî bi xêr li Mihemed Axa
wê kiriye.

Mihemed Axa dibêjît:

Erê Saliyê Naso tu bi xêr hatî,
l'serserî ye,

Belê ka bo min bêje gûlê

Axayê giran digel min çiyê?

Saliyê Naso dibêjît:

Erê, Mihemed Axa, gûlekî mezin
qewimîtiye.

Her du kurê di Mîrê Paloyê min
kuştiye.

Min Xatun Kejê ji canê xwe re
revandiye,

Min wê qesda Xwedê û qesda
mala te kiriye.

Mihemed Axa dibêjît:

Erê, Saliyê Naso, weyê, sed car
weyê;

Befr û baran lê kir digel vê ba-
yê.

Mîrê Paloyê beraz e, û zilm e, li
dinyayê.

Em feqîr û jar; Mîrê Paloyê der
heq nayê.

Delall...

Emrê min borî û terka min dana.
Jinikê di guncê me di hîlebaz
in, henekar in,
Û hemî roj ser canê min û te
diborin.

Kurik dibêjît:

-Erê, keçikê, dîne, tora dibin
tora;

Ezê hingê terka te dan im heta
mirêt me,

Serê xwe rakin şaxî gihora,
Heylo! delall!...

-Kuriko dîno, her-wa ye, û her
wa nî ne.

Deyka xwe bikuje, qetîl nî ne.
Ev canê ji cana xwe re birevîne.

Heylo! delall!...

Kurik dibêjît:

Erê keçikê dîne, ez deyka xwe
na kujim,

Û xwe qetîl nakim.

Tu bibî gulekî Mihemadî, te bih
na kim;

Tu bibî sêvekî Paloyê, te tam
na kim;

Tu bibî bûriya bihuştê, te mehr
na kim.

Heylo! delall! ..

Cana te li ser vî canî,

Û hejna te stûr e.

Min wê înayî hembana her vî
danî.

Memkê te dirêj in, ne qola ne.
Min wê înayî reş-gûnê, di he-
rama vî baranî.

Nizanim bihna wan xwegîr e,
Yan bihna kevna vî kurtanî.

Heylo! delall!....

-Tu kurtik î, û bilind na bî,

Û tu stûr î, û zirav na bî,

Û tu reş î, û spî na bî.

-Ez kurtik im, û bilind na bin,
Ez stûr im, û zirav na bim:

Şaniya lawikê çepel na bim.

-Were, were, were, şînî,

Qapî bişkê, were çînî,

Singê û memik ji qabil te ne,

Şeqlê mîrê tu ne şkenî.

-Rêka gellî, rêka me ye,

Tirîya Zaxo bala te ye.

Qewlê min û lawikê delal ev hey-
vê li ser me ye.

-Were, were, were zî ye.

Cotê zermemka da bû lawikê
delal û na razî ye.

Çavê lawikê delal ji bin ve, li
şûla dî ye.

Qemerê Ciwanê

Qemerê, Ciwanê çi şev şev e?

Ewra li ezmana teqê-reqê e,

Bîrûskî lêda, kir meşraqê e,

Balê memkê di kulmalê û kul-

mal babê wê dibîne,

Fincana di ferfûrî ne dor bî,

deqê.

Dê bimeş, bimeş, Qemerê bimeş,

Piştî emrê Siltan Ebdel-Reşed,

Li dinyayê bimeş: Qemerê Ci-

wanê!

Qemerê Ciwanê çûme Cezîra

Bota dikana pêşiyê:

Ezê şalekî ji Qemera malê kirim

dor bi rîşiyê

Ezê digel Qemera malê bi gerim

çerx û felekê, di dinyayê bi der-

wişî.

Dê bimeş, Qemerê bimeş,

Piştî emrê Siltan Ebdel-Reşed,

Li dinyayê bimeş.

Berhevdar: Th. Bois

ÇEKO BILINDO

Çeko bilindo heramo, ser çil û çar çiya
ketim:

Bilind firim û nizim ketim,

Bo dem axî sorgull, dîn bûm, har bûm,

şewdaser bûm,

Û bi çola xwedê ketim.

Çeko bilindo heramo, çûme çemê zîzani-

yê;

Belê hatime mergê zîzaniyê,

Qeda û sê sed beta bikevit li xîzaniyê:

Sala wê salê lawikê min kete eskerê Si-

lêmaniye.

Çeko bilindo heramo bê dar na bî;

Gellî di kûrên bê av na bîn;

Qewlê di eskeriyê dîr û dirêj in, çu cara

xelas na bîn;

Kî ditiye li dorya heft zemana keç li

mala babê xwe, piştî heft sala, li mala

babê xwe bê yar bî?

Çeko bilindo heramo, rê li ber e:

Kuriko dîno, tu kew gêrvan î, kew li

sera;

Xwezî ezê teyreklî bama ji vanî teyre


dî sê-fera:

Dormandorê Silêmaniye geri bama

hercar gera;

Xwezî min zant baya ji lawikê minê xêr e

yan şera.



Pireke mezin û çeleng, ev pir ji hesin û pola hatiye ava kirin.



Ji bergehên erdê Hindî-Çîniyê; parîsa Qesreke miranî û dar û çayedarîyên lê de.



Şaristanên Ewropagê mirêka pêşveçûna nijadên lê de ne.

Nisbeta Tîpên Kurdi

Di her zîmanî de, nisbeta tîpan li gora bihevketina bêjeyan diguhêre. Li gora tecrîbeyên ko heta niho di kovar û rojnameyên kurdi de hatine kirin, nisbeta tîpên kurdi, nemaze ji bo zarê Kurmancî bi awayê jêrin e. Bi vî mîxardî 20-25 rêzên Roja-Nû têne tertîb kirin.

a	130	m	75	A	10	R	5
â	20	n	130	B	10	S	5
ä	10	o	70	C	6	Ş	10
b	75	ô	10	Ç	6	T	5
ç	15	œ	10	D	5	U	5
d	75	æ	5	E	10	Ü	3
e	180	œ	5	É	3	U	10
ê	25	q	35	È	3	V	6
ë	10	r	100	F	3	W	8
ê	75	s	75	G	3	X	5
f	30	ş	50	I	10	Y	5
fi	5	t	75	İ	10	Y	5
fl	5	u	60	J	50	Z	5
fi	5	û	10	K	10		
g	5	ü	70	L	5		50
g	40'	ü	5	M	8		50
h	70	v	40	N	10		25
i	180	w	50	O	5		15
î	7	x	30	O	3		10
î	5	â	10	P	5		15
j	45	y	50	Q	5		24
k	50	z	25			24	
l	50					20	
						20	

Cigareyên Tamdar

Cigreyên çetîr û tamdar, yê Rejîya Libnan û Sûriyeyê ne. Jockey-Klub, Yekemîn, Befra, Tatli-Sert, Vircinya, Oriyen, Zodiyaq; ev cigareyên he hemî, ji tiînen çetîr û paktir tîpe çêkin. Piştî xwarinê cigareke baş, rilê cigervexwaran vedike.

Gava dixwazin cigarekê vexwin, navên Jukey Klub, Yekemîn-Birincî, Befra, Tatli-Sert, Vircinya, Oriyen, Zodiyaq binin ji ra xwe û yek ji wan paketan, bîxwe re bibijêrin.

ÇAPA KURDI

Niho bi zîmanê kurdi hevde kovar û rojname derdikevin. Ji van pê ve, li Bêrûtê, her pînzde roj carekê, bi zîmanê frensîzî rojnameyek derdikeve; navê wê « Le jour Nouveau » ye; çar rûpelên di wê ên mezin hene. Ev rojname qala çand û nivîsar û siyasetê Kurdistanê dike û doz û dehwa miletê Kurd, tîze pêşçavên cihanê. Ev in navên kovar û rojnameyan û welatên ko tê de tîne çap kirin. Li Sovyetistanê: Riya Taze, Kovara Qeşqasê.

Li Iranê: Peyam; Nîstîman, Kûhistan, Zegros. Çiya, Tîrîske, Yekîtîya Têgûştin. Li Iraqê: Azadî, Jîyan, Gelawêj, Dengî - Kîltîyî - Taze. Li Şamê: Hawar, Ronahî. Li Bêrûtê: Stêr; Rojû Nû.

PEHIZOKA TÊ

Ey hêl hêl hêl...
Ev roka pehîz e, me ne kirî kar û barê di vê zivistanê.
Çiyakî di jorfî girtî mij û moranê.
Deştêka di jêrfî dixwezit dar û barê di vê dûbanê.
Ji xêra Xwedê re ez di kelekî porî bama,
Dema lawîkê min derketiba,
Rav û nêçrê li ber hâtîne tol û tajiye,
Û ketibama hewîngêkî jê di kafîrzanê.
Derda li min! Derdal
Lawîko dîno, destê xwe ji xal û nîşanê min berde.
Şevkokê di çêrfî dirêj in;
Pîrekê di vî zemanî Şeytan û awên in.
Bi hênceta sêl û êgîrî dê êno bi ser halkokê di min û te de.
Evroka pehîz e, me ne kirî kar û barê di vê kanûnê.
Çiyakê di jorfî girtî mij û moranê.
Xamilê xwe werandin kevna rezê di Dêrebûnê.
Mewt bi malol! Tu çime ji warê havîne day'ne kir?
Ba tu nizanî evroka pehîz e, demê malbelavbûnê?
Hey derda li min!

RADYO

Weşînekên heroje bi zîmanê kurdi:

Li Bêrûtê

Radyoa Bêrûtê; hero piştî nîro, li saet pînc û sih deqîqan de, li ser pêlên kurt û navîn bi zîmanê kurdi nûçeyên Cihanê ên dawîn belav dike. Dirêjahîya pêlan: pêlên kurt 37 mêtir û 34 sentîmêtir, an 8.036 kilo sikil; pêlên navîn 411 mêtir, an 730 kilo sikil.

Radyoa Kurdistanê;

Li ser pêlên kurt diweşîne; dirêjahîya di wan; 42 û heta 44 û nîv mêtiran; berî nîro li saet 11 û 45 deqîqan de, dest pê dike; û nîv saet, dom dike.

Radyoa Azîrbîcanê;

Hero piştî nîro der saet pîncan, li ser pêlên dirêj bi kurdi diweşîne. Pêlên dirêj: 1410 û heta 1415 mêtiran. Ji van pê ve hin radyoyên dinyayê stranên kurdi diweşînin; mîna yê Moskova, Erîwan Paris û Londrê.

Li Bexdayê:

Hero piştî nîro di saet çaran de, destpê û heta pîncan dom dike. Dirêjahîya pêlan: 42 mêtir û 37 sentîmêtir; pêlên kurt.

Ronahî - Rabûn

Sibeye zû roj li me hilatî
Ronahî li me dike xelafî

Da em ji herin rûnî digel wan
Peyvê xwe bikin li nik cîvalan

Da kursîk-jî bo me bête danî
Qedrê xameya me bête zanî

Îro me heye digel wî sozek
Te - Yîne bike jî bo me rojek

Sundê dixum her bi navê gezdân
Êşû elemê bikuj jî kurdan

Dara ko te çandî ser heşn bû
Sêvê ko me xwarin nû gîha bû


Çavên di siya li me helat bû
Kêf û hunera me nu xuyabû

Em rabin êdî ji nav nîvînan
Da keyfê bikin li bazê Kurdan

Xurşîd tu here welat bîbtîne
Mizgînî şahî jî bo me bîne


A mûda Xurşîdê Serhedî

MIRÊKA CIHANÊ



Welatên Rohelatê Dûr

Hindistan, Çîn, Hindi-Çînî, Siyam, Japonya di Rohelatê Dûr de ne. Erdên Rohelatê Dûr xwedî şendariyeye kevn û mezin in. Qesîrbendî; neqîşkari, wêneqari; felsefe di wan welatan de zehf pîşve çûne û berxurdar bûne. Ewe wêneyek jî avahiyên Seygonê.



Xestexanekî Mezin

Di hemî şaristanên mezin û bajarên pêşveketî de, xestexaneyine gewre hene; ew xestexaneyê Seygonê.